

- BIDEŞTKETIN
- BANDORA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ LI SER REWŞA KURDÊN EWROPAYÊ
- RÊZA SEMÎNERAN
- XANÎYEK JI KOMELÊ RE
- ARMANCA MÊTINKARAN YA LI HEMBER ZIMANÊ KURDÎ Û HELWESTA CIVAKA KURD

EEN CULTUUR ONDER WATER: HASANKEYF



- PRESENTATIE VAN DE BUNDEL "INTERCULTUREEL DEN HAAG-EEN SUCCESSTORY"
- TRAININGSWEEKEND KOC-KAK
- INTERVIEW MET FERHAT BOSKAN

Kurdnasîn organa KOÇ-KAK é ye.
u ji sê mehan careke derdikeve.

Kurdnasîn is een uitgave van KOÇ-KAK
Kurdnasîn verschijnt 4x per jaar.

Redaksiyon / Redactie

B. Baran

Leyla

Ferhat

XEbatkar / Medewerkers

X. Uso

Brûsk

Rojin

Zelal

Pergela Rupelan / Grafische Vormgeving

Şefik

Mehmet

Adar Graphics

Navnişana Redaksiyonê / Redactie Adres

KOÇ-KAK

Klarendalseweg 468

6822 GW Arnhem

Navnişana Postê / Post Adres

KOÇ-KAK

Postbus 1092

6801 BB Arnhem

E-mail

kockak@nistiman.com

redactie@nistiman.com

Çapxane / Drukkerij

Adar Graphics

NAVEROK/INHOUD

BIDESTKETIN 5

BANDORA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ LI SER 7
REWŞA KURDÊN EWROPAYÊ

RÊZA SEMÎNERAN 9

XANÎYEK JI KOMELÊ RE 11

ARMANCA MÊTINKARAN YA LI HEMBER 13
ZIMANÊ KURDÎ Û HELWESTA CIVAKA KURD

HASANKEYF: 15

"EEN CULTUUR ONDER WATER"

PRESENTATIE VAN DE BUNDEL 17

"INTERCULTUREEL DEN HAAG-
EEN SUCCESSTORY"

TRAININGSWEEKEND KOC-KAK 19

INTERVIEW MET FERHAT BOSKAN 21

RÊZIMAN/GRAMMATICA 24



BIDESTKETIN

B. Baran

Bi şerê kendavê re, ji alîye hêzên hevgirtî ve hêvîyek mezin, bawerîyek bilind ji gelê kurd re hat dayin. Gelê kurd di bin vê hêvî û bawerîyê de, li dijê nîrê mêtinkar, nîrê hov û xwînxwar bi tevayî li seranserê Kurdistanê başûr dest bi serhildanan kir. Di demek gelek kurt de, hema bêje tevayîya Kurdistanê başûr ji hêzên Saddam rizgar kir. Lê bi rawestandina şerê kendavê ve hêzên hevkar dest ji ber Dîktatorîya Saddam kişandin.

Pêre bi xebitandina her hawê çekên komkujîyê ve hêzên mêtinkar, hêzên Saddamê xwînxwar ji nûjen ve êrîş berdan ser Kurdistanê. Vê êrîşa dijwar û bêpergal, vê tevkujîya netewî li ber çavên dinyayê û bi bêdengîya hemî hêzên navnetewî pêk hat. Gelê kurd bêçare ji ber vê êrîşa dijwar, ji ber wan çekên komkujîyê, ji ber karanîna çekên jehrî û kimyayî û bîyolojîk bi milyonan tevî pîr û zarok û ciwan, nexweş û saxlem bi carek ji cî û warê xwe ketin ser çîyan, di nav Kurdistanê dabêşkirî de xwe avêtin pişt sînorên ku li ser sînga Kurdistanê daxkirî û ketin ber bêbextîyên mêtinkarên din yê welatên wan wêrankirî. Tevî vê koçberîya gelêrî ji alîkî ve jî, şer û berxwedana pêşmergeyên Kurdistan li hember wê êrîşkarîya dijmin; bi helwesta bilind û bêhempa "ya Kurdistan, ya neman" bi hawek gelek dijwar dom dikir.

Yekîtiya Netewan li hember bi milyonan koçberbûna gelê kurd bêçare ma û hinek ji perçê Kurdistanê ji hovîtiya Sedamê xwînxwar parast û kurdên koçber zivirandin ser vî perçê ji dijmin parastî.

Ji wê demê û şûnde tevgera Kurd bi biryara YN û bi parastina hêzên hevgirtî, di bin serkêşîya PDKI û YNK de hilbijartin pêkhanîn, Parlamentoya Kurdistanê ava kirin, Mîrîti û dezgehên desthilatîyê ava kirin. Gelê kurd, ji vê û şûnde her çend pêşeroja wî ewçend zelal nebû jî, lê bi hawek azad û di bin mîrîtiya xwe de hebûna xwe domand. Parlamentoya Kurdistanê gawek din pêşde çû û biryara Federasyonê girt. Gelê kurd tama azadîyê, tama mîrîtiya xwe, tama dezgeyên desthilatîya kurdî, tama perwerdebûnîya kurdî, yanî bi herhawî tama jîyaneke kurdî û azadîyê jîyan. Vê tecrûba hanê di warê netewî û navnetewî de bîngehek pêşerojê ji gelê kurd re amade kir. Her çend di nav vê tecrûba hanê de gelek nexweşî û birînen mezin di laşê jîndarîya kurd de hatin vekirin û bû egerê êşên mezin jî, lê bi encamên xwe ve serketinek bilind ji bona netewa kurd amade kir.

Destdirêjiya hêzên hevgirtî û YN li hember dîktatorîya Saddam li gora xwe; ji ber egerên cuda nivco mabû. Hêzên hevgirtî di pêşengîya DYE (Dewletên Yekbûyîya Emerîka) de dixwest vê nivcomayîne teva bike, lê mercên navnetewî û rewşa pêşeroja Iraqê dest nedidan vê tevakinê. Ji ber vê jî her ku diçû midaxele şûnde dihat havêtin. Ev mijara hanê bi serê xwe ye û gelek alî ye. Meriv dikare eger û şîrovên gelek cuda jê re bibîne. Ji ber ku mijara me li ser destketinên Kurdistanê ye, ez tenê dixwazim li ser vê rawestim.

Piştî êrîşa 11 Îlonê destdirêjkirina Afganistan û rewşa navnetewî, bêyî rakirina dîktatorîya Saddam rêyek din li ber DYE nema. Ji ber ku her diçû kiryarên Saddam dihat jibîrkirin. Petrola di bin destê dewleta Iraqê de demek dirêj ji bazara dinyayê dûr ketibû û ji bona sermayedaran nedibû ku hîna demek dirêj weha bidome. Her diçû bazarek vala tenê bi rêya qaçax, bi rêya reş ji alîyê hinek dewletan ve yekalî dihat nîvdagirtin û gelek hêzên din jê bêpar diman.



Ev jî dibû egerê ku gelek dewlet daxwaza pêwendiyên normal bi Iraqê re ve kin dikirin. Ji aliyê din ve mayina Saddam di raya giştî de; dibû egerê rakirin û rûxandina rûmet û bawerîya mîrîtiya DYE bi xwe jî. Li ber vebûna desthilatdariya tevayîya dinyayê, rûxandina bawerî û rûmetê ji aliyê DYE ve nikaribû bihata pejirandin.

Ev bû egerê ku kî li hember derkeve bira derkeve, encamên wê çî dibe bira bibe, Hêzên Hevgirtî di bin serokatîya DYE de mîrîtiya dîktatoriya Saddam rakin. Ji ber vê jî; piştî gengeşiyên dijwar, pevçûnên hêzên desthilatdar yên dinyayê, tevî rûdana nexweşî û cudabûniyên nav Konseya Ewlekarîya YN û NATO yê di 20 Adara 2003 yan de di bin serokatîya DYE de hêzên Hevgirtî êrîş berdan ser mîrîtiya hov ya Saddam.

Di nav sînoren dewleta Iraqê de, tenê hêzek çekdar û xwurt li dijî vê mîrîtiya xwîn mij hebû ew jî hêza Kurdan bi xwe bû. Bêyî piştgirîya hêza Kurd mîrîtiya Saddam dikaribû bêt rûxandin lê avakirina mîrîtiyek nû, pêkhanîna aşî û bêdengîyek li pêşeroja Iraqê nedibû. Ev jî, ji bona dewletên mêtinkar yên ku Kurdistan di nav xwe de parve kirine, dibû egerê alozî û sergêjî û metirse mezî. Vê rewşa hanê him ji ber hovbûniya mîrîtiya mêtinkar ya Tirkîyê û him ji ber têkilîyên Tirkîyê û DYE bû egerê gengeşî û sergêjiyek mezî ji bo DYE.

Di vê navberê de desthilatdarên kurdan li başûr him di nav xwe de, him bi mixalefeta Iraqê re û him bi hêzên Hevgirtî re gavên hêja û girîng havêtin. Li ber van gavan li hember hestên hovane yên mêtinkarên Tirkîyê helwestek gelek hêja stendin û rewşa xwe ya stratejîk gelek xweş bikarhanîn.

Ev rewşa hanê, bû egerê berbiçavbûna pirsgirêkên têkilîyên navbera Tirkîyê û DYE jî. Tevî gengeşiyên vekirî û veşartî DYE û hêzên hevgirtî rojek berya newrozê êrîş berdan ser hêzên mîrîtiya dîktatoriya Saddam. Di destpêkê de ev êrîş bi harîkarîya rêvekirina dewleta tirk ve hat amadekirin lê ji ber metirsa destketinên gelê kurd mêtinkarên tirk ew rê jî girtin û têkilîyên Tirkîyê û DYE ket rewşek gelek xirab. Ev jî ji bona gelê kurd di rewşê de destketinek baş bû. Di Iraqê de hêzên pêşmerge jî bûn hêzek ji hêzên hevgirtî yê êrîşkarên ser dîktatoriya hovê Saddam.

Ev tîştêk vekirîye ku aliyên şer di dawiyê de jî, çî serketî bin yan binketî bin, hevparên wê dawiyê ne jî. Hêzên kurd, piştî şer jî, li Kurdistanê û hinek deverên pêwist bûn hêzek ewlekarî û parastinê.

Tevgera Kurd, di payek herî bilind de, ji aliyêkî ve, di avakirina pêşeroja Iraqê de cî girt û bi hemî aliyên Iraqî û hêzên hevgirtî re ketin nav têkilîyên germ. Lê ya herî girîng jî, tevgera kurd, di nav xwe de roj bi roj di warê yekbûnî û hevgirtinan de gavên gelek hêja havêtin. Destpêkirina pêkhanîna biryara geşkirina Parlamentoya hevbeş, biryarsendina yekkirina mîrîtiya hevbeş û avakirina komîteyek bilind ji nav herdu hukumetan û herdu partîyan (PDK û YNK), gavhavêtinên unîversîteyên Kurdistanê, biryarsendinên yekkirina perwerdekirinê, yekkirina rêxistinên mamosteyan û hwd. Roj bi roj başûrê Kurdistanê di her warê jîyanê de; di warê rêvebirinî, aborî, perwerdeyî, parastinî, xizmet, avadanî û hwd. de ber bi yekbûniyekê ve gavan davêje. Ev bi xwe ji bona gelê kurd destketinek bêhempa, gelek hêja, bilind û bi rûmet e. Van gavên hêja serê me li ber hundur û derve bilind û payedar dike.

Herçend ji binî ve avakirina mîrîtiyekê gelek dijwar be jî, lê eger ew li ser kavi lê rûxandina dîktatoriyek wek ya Saddam bêt avakirin hêjî diwartir e. Ger ew li ser wan tovên bêbawerîyên ku bi dehên salan hatiye çandin bêt avakirin, diwartir e. Wer xwanê ye ku li Iraqê bawerîya tu malbatê, tu êl û tu mezhebî bi hev nema ye. Tu kes, zû bi zû bawerî bi berpîrsîyarîya kesekî din nayne. Li gel vana jî, ew hêzên dev û destên wan bixwîn in, ji metirsa pêşeroja xwe be jî, bi hev re ne û li her deverê ji bona xirakirinê di nava tevgerêk dijwar de ne.



BANDORA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ LI SER REWŞA KURDÊN EWROPAYÊ

X. Ûso

Netewa Kurd, di cîhanê de, di nav neteweyên bê dewlet de, bi hejmara xwe, ya herî pir e û hina jî bê dewlet e. Bêdewletbûyina kurdan, bandoreke neyînî di warê ideolojî, psîkolojî û kulturî de, bi tevayî li ser hemî Kurdan û bi taybetî li Kurdên Ewropayê kiriye. Heta ku gelê Kurd negihê mafên xwe yên rewşa û Kurdistan bi tevayî rizgar nebe, ev bandora neyînî dê her berdewam be.

Her mirovek xwedîyê nasnameyek neteweyî ye; yanî xwe xwedîyê welatakî, netewekê û di bin ewlekarî û parastina dewleta xwe ya neteweyî de dibîne. Mirovekî ku li welatekî biyanî dijî, çi ji bo karkerî û çi jî wek penber ji welatê xwe derketibe, li gor hiqûqekî wî welatî dijî û peymanên navnetewî dijî. Herweha li gorî wan peyman û hiqûqan xwedîyê mafên sîyasî, kulturî û aborî ye. Gava di van waran de neheqîyek lê were, an pirsgirêkek jiyanevî derkeve pêşberî wî/wê, dikane alîkarî ji dewleta xwe bixwaze, an biçe welatê xwe. Lê ji bo Kurdan tu demê ev hiqûq bi kar nehatiye, piştgirîyek çê nebûye û ji ber bêdewletbûnîyê ewlekarîya wan her tune ye.

Her endamê neteweyekê ku li welatekî biyanî, di hundir sînorê dewletekê, beledîye an herêmekê de, xwedî hejmareke têr bin, mafê wan yê komeletî, xwendina bingeîn ya bi zimanê zikmakî, weşana radyo û hwd. hey e. Li gelek deverên biyanî, tevî hejmara xwe ya têrker, Kurd ne xwedîyê van mafan e, an bi egerên bêdewletbûnê ew bixwe jî cesaret nakin ku van mafan bidest bixin; lewra ew li welatê xwe jî ji van mafan bêpar in.

Endamên neteweyek bêdewlet, hem li welatên ku lê dijîn û hem li hemî cîhanê, di warê bûyer û guhertinên sîyasî, hiqûqî, aborî û leşkerî de gelek caran ne xwedîyê helwestek vekirî ne. Ev jî, ji bo wan kesan bêdeolojîbûn û apolîtîzasyonê bi xwe re tîne.

Ya din jî ku mirov li welatekî biyanî bijî û mirov xwe endamê wî welatî nebîne, an mirov ger bixebite bibe endamê civaka biyanî jî, lê ew civak wî mirovî wek endamekî xwe yê rastî nepejirîne, an wî li welatê xwe nexwaze, ji bo wî mirovî rêya ku xwe li welatê xwe bigire dibe rêya çareserîyê. Lê ew mirov, endamê neteweyek kolonî û ne azad be, wê gavê dikane xwe ne di neewleyîyê de, an di xeterê de bibîne û têkeve nav problemên psîkolojîk. Li gorî min, ji bo gelek Kurdan ev bingehe sendromek psîkolojîk e.

Piştî hem fiilî û hem jî hiqûqî rizgarbûna başûrê Kurdistanê, hêvîya rizgarîyê û azadîyê, an hesta hebûna pişteke, xwedîyekî û hebûna starekê, pêşî ji bo hemû Kurdan û duyem jî, ji bo Kurdên li welatên biyanî dijîn çêbû. Vê rewşê, ji bo jîyanek bi ewleyî û parastinê, bawerî ji gelê Kurd re çêkir. Gelek Kurdan xwe bênasname, an xwedîyê nasnameyek biyanî û winda didîtin, lê niha bi bi dilgermî û serbilindî, xwe xwedîyê nasnameya xwe ya neteweyî dibînin. Kurd ji asoyek bi mij, êdî bûn xwedîyê asoyeke neteweyî ya zelal û rohnîtir.

Kûrd li parçekî welatê xwe, an li welatekî biyanî bi egerekê nikanibin bijîn, an xwe di tahlûkeyekê de his bikin, diramin ku êdî piştekan wan û cîhekî ku bêminet xwe lê bigirin û bavêjinê heye. Ev jî di warê psîkolojîk de, rehetî û hestek ewlekarîyê dide mirovan.



Di vê rewşê de gelek Kurdên ku ji sîyasetê sar bûbûn, an dûrî sîyasetê bûn, êdî ji nû ve li sîyasetê germ bûne. Ne tenê di warê sîyasetê neteweyî de, di warî sîyasetê navneteweyî de jî geşbûneke berbiçav xwe nîşan dide. Êdî ji bo Kurdan, li cîhanê hêz, an dewletên dost û ne dost zelaltir dibin. Ji niha de xwanê ye ku Kurd, dibe bêtir bi aborî, borsa an bazirganiya cîhanê re têkeldar bibin. Kurd êdî li gor heza xwe ya aborî, siyasî û netewî, bûyerên cîhanê ji hev bigerin û bibin xwedîyê lînerin û helwestên îdeolojîk û polîtîk.

Kurd, di vê rewşê de, di derbarê mafê netewî, siyasî, hiqûqî, gelhûrî, çand, ziman, dîrok û hwd. de, li her dera cîhanê bêtir û vekirîtir dikanin mafê xwe biparêzin, xwe bi rêxistin bikin û xweîfade bikin.

Berê di warê pêşbazîyên folklorîk, muzîk, spor û hunerên din yê navneteweyî de, ji ber hoyên bêdewletbûyinê, yan Kurd nikanîbûn beşdar bibana, yan jî zorga dibûn ku li ser navê dewletên mêtinkar beşdar bibana; lê ji aniha û pê ve Kurd wê bixwazin li ser navê Kurdistanê beşdarî pêşbazîyên navneteweyî bibin.

Ji bo ku başûrê Kurdistanê, mîna her parçeyê din heta niha kolonî bû, aborîya wê ji alî mêtinkaran ve mîna aborîyek talanê dihat bikaranîn. Loma Kurdistan û gelê Kurd ji her warî ve bi şûn de mabû.

Nuha her Kurdekî welatperwer ku di warekî zaniyarî, teknîkî û hunerî de perwerde bûbe, bi hêsanî dikare biçe li Kurdistanê pişe û hunerê xwe, ji bo berjewendîyê çand û pêşdexistina welatê xwe bi kar bîne.

Ya herî girîng jî, hestên neteweyî bi her Kurdekî re bihêztir bûye. Divê Kurdên başûrê Kurdistanê û otorîteyên wan yê siyasî, ji bo berjewendîyên hemî Kurdan van hest, hevî û daxwazan bi erênî û neteweperwerî bi kar bîne.

Wek her Kurdekî welatperwer ez jî, ji bo daha-tûyek demokratîk, azad û serbixwe bi hevî me!



RÊZA SEMÎNERAN

B. Bêwar

Her rêxistin wek her jîndarekî dixwaze pêşkeve, serfiraz be, xwedi rûmet be. Pêşketin û serfirazîya rêxistinan jî bi hest û helwestên rêvebir û endamên rêxistinan ve girêdayî ye. Ji ber vê jî; ji bona her rêxistinê, bi xebatên xwe yê rojane re, pêwistî bi xebatên xwe yên jîndariyê jî heye. Xebatên jîndariya rêxistinan ya herî girîng jî xebata têgihîştandin û hînkariya endaman e. Di bin vê zanebûnê de komela me Komela Çanda Karkerên Kurdistan (KOÇ-KAK) ê di meha şêşan de yek ji xebata hînkariya endamên xwe pêk hanî.

Armancên van xebatên hanê piralî ne. Ji alîyek ve li ser beşên cuda hînkariyek bide endamên xwe; da ku endam bêtir têbigehîjin, bêtir têkevin nav jîndariya xebata komelê. Endamên komelê çend têgihîştî bin, wê ewçend jî bi dilek germ, bi bawerîyek bilind, bi hewesek balkêş têkevin nav xebata komelê. Wê endam ne tenê bi hêviya dayîna vatinîyekê rawestin, wê ew bixwe ji bona xebata rêxistinê xwedî pêşniyaran bin, xwedî helwestên karderxistinê bin. Gava endam bi dilekî germ û bi bawerîyek bilind beşdarî xebata komelê bibe; wê demê endam, wê fedekarîyek mezin jî nîşan bide. Wê rêvebir jî, di biryarstendinan de, di amadekirinên bernaman de, di kardayina endaman de dudilo nebin, wê hêza xebata rêxistina xwe zanibe, li gor wê zanibe bi asanî gav bavêje. Her çi rêxistin dibe bira bibe, gava endam xwedîyê fedekarîyek weha bin jî, tu car pişta wê rêxistinê nagîje erdê. Ew rêxistin tim wê serbilind be, xwedî rûmet be. Ji alî din ve, rêxistin her çend xwurt û xwedî rûmet be jî, pêwist e ku berê wê hertim li pêş be, xebat û kiryarên mezintir bide pêşîya xwe, li pêşîya dem û jîyanê bimeşe.

Armançek din ji van xebatan jî ew e ku endamên rêxistinê bi hev re demek xweş û dilşad bubuhurînin. Firsendên bi hawek gelemperî li ser jîyana rojane jî galgalê bikin. Bi hev re bimînin, bi hev re bigerin, bixwun û vexwun. Gava meriv bi hev re demekê bimîne tiştek xwezayî ye ku meriv bêtir bihev germ dibe, bêtir nêzikî hev dibe. Ev jî, pêwistîyek ji pêwistîyên bingeşîn ya endamatiyê ye. Li gorî vê zanîna, komela me ji berê de li gor hêza xwe, xebatên weha pêk tîne û ji niha şûnde jî wê li gor karîniya xwe pêk jî bîne.

Komela me vê xebata xwe ya hanê bi Odyssee re amade kiribû. Yanî wek qurs yan jî semînerên werê mamostê fermî û di mişarên xwe de pispore amade kiribû.

Mijarên van kursan jî bi giranî; pêwistîya avakirina komeleyekê, danîna hedefa komelê û xebata ji bo gehîştina armancê û pê re bi giranî li ser têkilîyan hatibû amade kirin.

Di vê demajoya kursan de, bi hawek berfireh li ser rewşa dema avakirina KoÇ-KAK ê û pêwistîyên wê demê yên bi komelek weha hat rawestandî. Hedefên ku di dema avakirina komelê de hatibûn danîn çî bûn hat vekirin. Gelo di demajoya Komelê de, çend ji wan hedefan pêkhatin û çend ji wan pêk nehatin bi hawek gelemperî, bi pirs û bersîvan û bi lîstînan endaman ve, hat nîqaş kirin. Pê re jî, bi endaman re gengeşîyek hat vekirin ku ji dema avakirina komelê û vir de; gelo kîjan hedefên komelê wek xwe mane û kîjan ji wan hatine guhertin û çima hatine guhertin? Li gel vana, mişara têkilîyan bi hawek berfireh hat vekirin. Li ser têkilîyên nav komelê û derveyî komelê hat rawestandî.



Qurs bi hawek zelal û xweş buhurî. Her endam bi dilgermî beşdarî hemî mişarên kursan bûn, lînêrînên xwe vekirî hanîn ziman. Beşdar, bi dilgermî tevî gengeşîyan dibûn. Beşdar, ji dervî rûniştinan jî, di nav xwe de, gelek caran li ser mişaran dipeyvîn û gengeşî dikirin.

Ez dikarim du kêmasîyên berbiçav jî vekirî bînim ziman: Yek ji kêmasîyan ew bû ku, car caran gengeşî bi nezanî ji mişara xwe derdiketin, weka ku; "mamoste hakimê serserê komelê be û ew hatibe wê derê ku hinek kes derdên xwe jê re bêjin, da ku ew jî derdên wan çareser bike". Kêmasîyek din jî ew bû ku hinek endaman hêj têngîştibûn ku van civînan ji alîyê Komelê bi xwe ve hatîye amade kirin û Komele bixwe berpirsîyarê rêvebirina van xebatan e. Mamoste hatîye vexwendîkirin, ji bo ku ji endamên Komelê re kursan amade bike. Ji ber têkilîya germ ya navbera mamoste û Komelê, wê cudahîya paşçav dikir. Li gel vana, ji endaman re berî qursê bername nehatibû şandin; endaman bername li cîhê xebatê stendin. Ev jî kêmasîyek bû ku li wê derê bû egerê gengeşîya li

ser kêmasîya têkilîyên navbera mamoste û Komelê û endaman. Pêwist bû ku endam li ser rêvebirin û berpirsîyarîya kursan baş hatibana agadarkirin û pê re jî bername, berê ji endaman re hatiba şandin.

Ji dervî van kêmasîyên hanê endam ewçend kêfxweşbûn ku; bi dilşadî pirsra qursên pêşîya me dikirin, ji bo ku xwe amade bikin, dema xwe vala bikin û beşdar bibin.

Pêwist e ku meriv bêje cîyê kursan jî cîyek gelek xweş û modern bû. Beşdarên kursan li dervî rûniştinan gelek dilfireh û aram bûn, xizmet ji bona wan bi her warî amade bû. Cîyekî bêdeng, xwezayîyek maldar bîna meriv fireh dikir. Ev jî yek ji egerê kêfxweşîya endaman bû.

www.arsivakurdi.org



XANÎYEK JI KOMELÊ RE

B. Bêwar

Her rêxistin dixwaze ku cîyekî wê hebe. Her komel dixwaze xanîyekî wê hebe da ku bi asanî tiştên xwe lê deyne, dema bixwaze veke, civînan lê amade bike. Yanî xwe tê de asan bibîne. Ev tiştêkî xwezayî ye ku Komela me jî; ji avabûna xwe de di nav helwestek weha de bûye.

Vê helwesta hanê, di destpêkê de, xwe bi avakirina Navenda Kurdistan nîşan da. Komela me, tevî hinek komelên Kurd, di wê demê de, bi vekirina Navenda Kurdistan gihîşt armanca xwe. Heta rewşa Navenda Kurdistan wek xwe ma bû; pêwistîya Komela me bi cîyek din tune bû. Ji ber ku Navenda Kurdistan, di her warî de bersîva pêdivîyên komelê didan. Ev ne tenê ji bona komela me, ji bona komelên kurdan yê din jî weha bû. Lê dema rewşa Navenda Kurdistan guherî û komela me bê cîh ma û pê ve; ji bo cîh pêwistîyek mezin peyda bû.

Carekê xwezayî ye ku pêwistîya her komelê bi cîhekî hebe. Ya din em bûn xwedîyê cîhekî û em hînî tahma xweşîya wî cîhî jî bûn. Me hemî alavên xwe bi asanî li komela xwe bi cîh dikir, arşîvek amade dikir. Lê sed mixabin, em dîsa bê cîh mabûn, alavên me li malan belav bûbûn. Ji bo civînek xwe, em li ber deriyên avahîyan digerîyan. Ev rewş jî me re gelek giran dihat. Lê dîsa sed mixabin, hêzek me tunebû ku em karibin xanîyekî xas peyda bikin. Ji ber wê jî me di destpêkê de, heftê dahnek ji bo Komelê cîhek, pê re jî ji bona dayina dersên zimanê kurdî ji zarokên kurd re heftê dahnek cîyekî din û paşê jî, me ji bona fêrkirina govenda kurdî, dahnekî cîyekî din jî kirê kir. Di heftê de bû sê cîh û sê dahnên xebatê ji bona Komela me. Lê cîyekî me tunebû ku em alavên xwe tê de deynin û cîyek me tunebû ku li dervayî van demên dahnana da ku pêwistîyek me hebe em karibin bi asanî xebatek xwe lê bikin. Dema civînek jî pêwist bûna, ya gerek me têxista dema xebatê xwe yê rêzkirî yan jî pêwist bû em li cîyekî din bigerîyana. Piştî wê hînbûnîya Navenda Kurdistan, wê rewşa bi me pir giran dihat û me dilteng dikir.

Vê diltengîya hanê, di nav civînên Komelê de, bêyî ku îmkanên me jî hebin û rewşa me dest nede jî, gengeşîya kirîna cîyekî ji bona Komelê dihat nîqaş kirin. Çend sal berê, kongra Komelê, ji bona kirîna, biryara geryana li cîyekî stend û vatinî da rêvebirên Komelê. Lê bidestxistina cîyekî yê li gor hêza me ku bi hindikayî karibe pêwistîyên me pêk bîne, gelek zor bû.

Di mehên dawîya sala 2001 ê de, cîyekî li gor hêza me û gelek bi kêmasî be jî, li gor pêkhanîna pêwistîyên me, li taxa Klarendal (Arnhem) hat dîtin. Ev cîh berê dikan bû, lê di plana Beledîyê ya hatibû pêşniyarkirin de, wê ji bona xebatê civakî bihata karhanîn. Yanî li gor pêşniyara plana Beledîyê, ji meclisa Beledîyê re, li pêşîya xebitandina ji bo komelê tu asteng nexwîya bûn.

Piştî ji beledîyê, li ser cîh û xebitandina cîh agahdarî jî hat stendin, Komelê, li ser vê rewşê, berê bi endamên xwe re civînek ama de kir. Komîta Rêvebir, li ser vê rewşê, dubare lînerînên endamên xwe girt. Komelê, bi erêkirina endaman ve, vî cîyê hanê kirî. Lê piştî me cîh kirî, dezgeyên dijgurdî bi hawek lez ketin nav kar. Tirkên ku bi tevayîya jîyana xwe ve di bin piropaganda nijadperestîyê de jîyane û ne tenê hebûna kurdan, belkî bihîstina navê kurd jî tevayîya hisên wan radike ser pîya û bîna wan diçikîne, bi lez li dijî Komela me ketin nav xebatê. Vê xebata hanê, dibê ku sererast jî ji aliyê hinek dezgeyên mêtinkar û nijadperest ve hatibe li dar xistin. Lê ev ne heşkere ye. Lê ger sererast nehatibe li dar xistin jî, dîsa bandora wan lênerîn û piropagandayên wan yê rojane bixwe ne.



Li taxê, li ser navê komela dikandarên taxê (ku tê de gelek tirk hene) û li ser navê hinek kesên Tirk, li dijî Komela me, li ba Beledîyê ku vê dera ji bona komelê neyê bikarhanîn, gilî hatin kirin. Xwanê ye ku hinek hevalbend jî di nav dezgeyên Beledîyê de ji xwe re dîtine ku; daxwazname me ya ji bona destûra vekirina Komelê û hinek guhertinên avahîyê ku me di Sibata 2002 yan de kiribû, heta nivê payizê jî nexistin kar. Piştî lêgerîna me ya li ser daxwazname xwe, ji nivê payizê û şûnde daxwazname me ket kar. Di vê navberê de, me li gor prosedora Beledîyê û avayîya dijşewatê hinek guhertin jî di nav xanîyê Komelê de pêkhanî. Di vê navberê de Meclisa Beledîyê li dijî gilîyê Komela Dikandarên taxê û kesên Tirk, biryara guhertina planê taxê da û cîyê me kiribû, ji bona xebitandina karê civakî amade bû. Lê pêwistî hebû ku ev biryara meclisa Beledîyê, ji alîyê Meclisa Eyaletê ve jî were erêkirin. Lê heta biryara Eyaletê, Beledîye li gor prosesê biryarên xwe dixê jîyanê.

Piştî biryara Meclisa Beledîyê, Komisyona Beledîyê ya berpirsîyar, ji bona ku em karibin vî cîyê wek komele bixebitînin, daxwazname me ya guhertina avahîyê û xebitandina komelê, li gorî daxwaza me jî, ji hev qetandin û di serê sala 2003 yan de li gor pirosesê destûra xebitandina komelê dan me.

Me dest bi vekirina Komelê kir. Me ji xwe re bernameke vekirina Komelê ava kir ku em karibin di heftê de çar rojan vekin. Me bi vî hawî dest bi vekirina wê jî kir. Lê mixabin hêzên dijkurd ranewestîyan û ji bona rawestandina biryara Beledîyê serî li Mehkemê xistin. Bi vê re li ser navê tirkekî din, îmzên ku du sal berê ji bona neheqîya cîranên xwe civandibûn, namek pêve kirin û wek îmzeyên teze, li dijî vekirina Komela Kurd hatine civandin, dan Komisyona Beledîya Arnhemê. Ji vê xirabtir jî, di nav van îmzan de, îmzên çend kesên kurd jî hebûn. Kesên kurd ji saxikbûnîya xwe, ji bona dij tadeyîya cîranên wan, du sal berê ev îmze dabûn, nizanibûn ku di çî rewşe de dibe bira bibe, hevkarîya bi nijadperestan re, bi gotinek din, hevkarîya bi kesên dijkurd re kirin, bi asanî dikare li dijî kurd bizivire. Weha jî bû; îmzê yen wan li dij hebûna komela kurd hat bikar hanîn.

Mehkema Arnhemê, serlêdana wan rast nedît; lê prosesa Beledîyê jî rast nedît. Ji ber vê jî Mehkema Arnhemê, ji bona sererastkirina prosesa biryara Beledîyê ku destûra xebitandina komelê, ji destûra guhertina avayîyê veqetandibû, rast nedît û biryar da rawestandin. Li ser vê biryara Mehkemê cîyê Komela me dîsa hat girtin.

Piştî têkilîyên bi beledîyê re, me li hev kir ku bi daxwaznameyêke din, di demek kurt de, bi hev re biryara Mehkemê ku sererastkirina pirosesê pêk bînin û destûra vekirina Komelê bistînin. Li gor vê lihevkerinê, em bi hêvî ne ku piştî tatîlê em'ê karibin xebata xwe di xanîyê xwe yê nû de pêk bînin.



ARMANCA MÊTINKARAN YA LI HEMBER ZIMANÊ KURDÎ Û HELWESTA CIVAKA KURD

X. Dawo

Armanca mêtinkaran, berî her tiştî, talankirina dewlemendiyên Kurdistanê yên sererd û binerd bûye; ji bo vê talanê bi serfirazî pêk binin jî, pêwîstiya wan bi mêtina keda gelê Kurd hebûye. Ji bo ku gelê Kurd ji talana dewlemendiyên welatê xwe û mêtina keda xwe re dengê xwe neke û ji mêtinkar û zordaran serî bitewîne, mêtinkaran dest bi înkâr, qedexa û rûxandina nasname, ziman, çand, dîrok û hemû rûmetên civata Kurd kirine. Gelê Kurd gava ku li hember vê zordariyê derketîye jî, mêtinkaran bi dijwarî, yanî bi îşkence, koçbarkirin, zîndankirin û komkuji bersîv dayîbê.

Neteweya Kurd, demek dûdirêj e ku ji her mafê xwe yê civakî, siyasî û çandî pêpar maye. Hebûna gelê Kurd ji alî mêtinkaran ve hatiye înkarkirin, aboriya wî hatiye talankirin, sazîyên wî yên civakî ji holê hatine rakirin û qedexekirin, li ser çand û zimanê wî siyasetek sistematîk ya asimilasyonê hatiye meşandin. Belkî di dîroka cihanê de yekem, ji alî mêtinkaran ve zimanê gelê Kurd bi fermî û qanûnî hatiye qedexekirin û ji bo ku bi zimanê serdestan nizanibûn hatine cezakirin. Gelê Kurd hatiye zorgakirin ku di çavrovê ya vê qanûniyeta mêtinkaran ya zordarî û çavrosiyê de tevbigere û mecbûr hatiye hiştin ku nasname xwe înkâr bike û zimanê mêtinkaran hîn bibe û bikar bîne. Lewra yê ku nexwestiya zimanê mêtinkaran hîn bibe, an fersenda wan ya hînbûnê çênebûbe, li qereqol, tapû, nifûs, nexweşxane, mahkeme û hemû daîrên fermî hem karê wan nemeşiyaye û hem jî lêdan, tif û heqaretên giran li wan hatiye. Ji bo ku bi zimanê serdestan nedizanîn, li dibistanên serdestan li zarokan û li leşkeriyê jî li xortên Kurd, ya lêdan û îşkence hatiye kirin, yan jî bêheş, gêj û eqmaq hatine dîtin; gelek zarok û xortên Kurd jî di warê psîkolojîk de gehîştine encama pirsê ku gelo ew kêmhêş û famkor in?!

Hemû dê û bavên Kurd, di bin vê polîtîka dijwar ya asimilasyonê mêtinkaran de hatine ecikandin, zilm, zor û tadeyî dîtine. Xwediyê "sûcekî" xwezayî, civakî û ji dervî îrada wan bû. Ji bo ku tenê kanibûn bi "zimanekî ji bo wan sûc" bû bipewivana, loma ji bindestbûnê pêve ne dizanibûn sûcê wan çi ye û ne jî kanibûn xwe biparastana. Helbet çareseriyek hebû: Birêxistinbûn û xwe ji bin destê wan zaliman rizgarkirin bû; lê ne rewşa wan, ne jî zanîna wan têrî vîna dikir. Lewra gelek salên rabirdû bav û kalên wan bi berdewamî serî hildabûn, şer kiribûn û xwîna xwe rijandibûn, bi egerên rewşa civakê, şaşî û xayintiyên giran hatibûn kirin, têk çûbûn, lema taqeta berxwedanê jî bi wan re nemabû. Xwedanek ji wan re nebû ku gazîya xwe bigehîninê û alîkarîyekê jê bixwazin. Ji neçarî, hêrs û kulên xwe di nava xwe de fetisandin. Bi tevayî civaka Kurd di ber xwe da û berxwedanek pasîf berdewam kirin; li rûmetên xwe xwedî derketin û peyivîn, stran, çîrok û çanda xwe parastin û bikar anîn; hertim li hêvî û fersenda berxwedan û serhildanek rizgarîyê ma; lê hinek jî ketin bin bandûrek neyênî û çavtirsandî bûn: ji çavrosî û zordariyê re serî tewandin, mêtinkaran ji wan çî xwest, pejirandin û înkara nasname xwe kirin. Ketin çalakîyek ku xwe bi neyrên nîjada xwe pejirandin bidin; loma yên werê heta ku li mala xwe zimanê xwe, li xwe qedexa kirin.

Egerên din jî hene, ji asimilasyonê û xerabûna ziman re: bazara bazirganîyê di destê serdestên mêtinkar de ye. Ji xwe leşkerî û dibistana seretayî mecbûrî ye. Pergalên behimandinê, alavên xerckirinê yên bi teknîka nû dihatin behimandin, bi zimanê serdestan tê binavkirin.



Li dibistan û leşkeriyê gotinên nû hatin hînkirin. Kesên ku bi siyasê û karê rêxistinî têkel dibin, divê pirtûkên zaniyarî, civakî, aborî û filosofi bi zimanên serdestan bixwîne. Di vê dema şaristanîya hemdemî de, pêwîstiya her civakê ji medya, ragihandin û komînikasyonê netewî û navnetewî heye; ku vana tev bi zimanê biyanî bîna xwendin û gohdarîkirin, ew jî dibin egerê xerabûn û wendabûna zimanê neteweyê Kurd ya di bin nîrê mêtinkaran de.

Hela vana tev li alîkî, hinek partî û rêxistinên ku li ser navê rizgarî, azadî û serxwebûna gelê Kurd derketin holê, mîna ku hunerek be, ji dêvla ku zimanê xwe bi kar bînin û pêşde bixin, dev ji zimanê xwe yê netewî berdan, zimanê neteweyê serdest bikar anîn. Ev jî, di warê parastina zimanê xwe de, ji bo civakê Kurd bandorek gelek neyênî kir.

Berdewamiya zimanê Kurdî, bêtir di destê dê û bavê Kurd de ye ku zimanê xwe biparêzin û di mala xwe de bi zimanê xwe bipeyivin û zimanê xwe hîni zarokên xwe bikin. Lê hinek dê û bav, menfî, hinek li gorî serpêhatiyên xerab yêna weke ku me li jor bilêv kir, hinek jî şaş li pîrsgirêka zimanê dinê. Hinek divên: "Zarokên me, bi kîjan zimanî wê bi xwediyê diploma û meslek bin, divê berê wî zimanî hîn bibin; Kurdî hîn bûye an nebûye ne pir grîng e". Yêna di vî warî de nezani, kêmani û xemên ku dîtine, naxwazin zarokên wan jî bibîne. Yêna din, zordarî û tadeya ku ji ber zimanê hatîye serê wan, naxwazin ku ew xerabî bêt serê zarokên wan jî. Yêna din jî dibêjin: "Zarokên me du zimana bi hev re hîn bibin, wê herdu zimanan jî baş hîn bibin; heger zarokên me berê zimanê serdestan, an yê dewleta biyanî ku lê dijîn hîn bibin, piştî wê zor, an xerabe hîn bibin; wê gavê jî wê di xwendina xwe de serfiraz bibin."

Gava ku em bala xwe bidinê, nasname netewakê, herî xurt di zimanê de xwe rê dide. Mirov ji dervî daxwaza xwe li welatekî û di civakê de tê dînyayê. Çarenûsa meriv ya dîrokî, aborî, siyasî û çandî bi ya wê civatê ve girêdayî ye. Înkara ziman, an înkara netewîtiya xwe, şolîkirina nasname xwe û xerakirina kesayetiya xwe ye. Dê û bav, di vî warî de xwediyê helwestek şaş bin, nasname û kesayetiya zarokên xwe jî xirab dikin. Loma ev helwesta dê bavên ya şaş, di seranserê jîyana zarokên xwe de, dibin egera gelek pîrsgirêk û aloziyên civakî, çandî, siyasî, perwerdeyî û psîkolojîk.

Zarokên ku xwediyê nasnameyê saxlem û vekirî bin, di warê psîkolojîk de, xwe azad û serbîlî dibînin û ji xwe bawer û razî ne. Bi zaniyarî hatîye peyitandin ku ji bo zarokê hînbûna dudo, an sê zimanan gelekî normal e û ne egerê tevliheviyê, lê berjewendiyê serfiraziyê ye. Gava ku em di warê rêzimanî, fonetîk û sîntaksê jî binêrin, ji bo hînbûna zimanekî Ewropî, zanebûna Kurdî, bi gelekî hêsantir e ji Tirkî an Erebi.

Weke ku têt zanîn, bi peywendiyên civakî, cudahiya mirovan ji lawiran çêbûye. Ev peywendî zimanek afirandîye. Temamê tevger, rêxistin, berhem, sazî, çand, bawerî û hebûnîya civakê bi rêya zimanê îfade bûye, gehîştîye wate û formekê. Her civak, di demajoyek dîrokî ya taybet û xweser re derbas bûye. Loma tu civak bi berhemên xwe yêna civakî, çandî û karakterîstîk bi temamî ne mîna yeke din e. Mademkî em wek endamê civakê Kurd hatine dînyayê, ji bo ku em ji xwe razîbin û kesayetiya xwe xwurt û geş bikin, divê em li zimanê xwe xwedî derkevin û geş bikin. Divê dê û bavê Kurd zanibin ku gelek rûmet û teybetiyên dîrok, çand û civakê Kurd di zimanê Kurdî de veşartî ye. Gava ku zimanê Kurdî hîni zarokên xwe nekin, zarokên xwe ji wan rûmetên civakê Kurd jî bêpar dihêlin.



HASANKEYF: "EEN CULTUUR ONDER WATER"

In het kader van haar activiteiten organiseert de Koerdische Arbeiders en Cultuur Vereniging (KOÇ-KAK) samen met de unit MCI, het Volks Buurtmuseum Den Haag en de Koerdische Arbeiders Unie voor een unieke fototentoonstelling over de stad Hasankeyf.

Hasankeyf, is een 5.500 inwoners tellend stadje, dat zo'n 200 kilometer ten zuidoosten van Diyarbakir ligt. De naam Hasankeyf is afgeleid van `Hisn Keyfa`, wat `kasteel van de grot` betekent. Smalle paden voeren langs steile rotswanden, waarin vele woningen zijn uitgehakt, die zelfs in de hete zomer een aangename verkoeling geven. De paden brengen de bezoeker naar de overblijfselen van de hogergelegen oude stad.

Volgens professor Merhdad Izady van de vakgroep Near Eastern Languages and Civilizations van de Harvard Universiteit is Hasankeyf "een goed bewaard juweel van Koerdische urbane architectuur" en "een levend museum". De meer dan 3000 jaar oude stad bloeide onder Suleyman I en zijn zoon Suleyman II tegen het einde van de 14^{de} en in het begin van de 15^{de} eeuw. Het is de enige historische stad in de regio die de middeleeuwen ongeschonden is doorgekomen.

Het fort, dat oorspronkelijk bedoeld was om Hasankeyf in onaangename tijden tegen veroveraars en plundersaars te beschermen is helaas niet meer in staat zijn oude functie te vervullen. Het stadje Hasankeyf ligt namelijk midden in een gebied waar de Turkse staat, aan een groot damproject werkt.

Ondanks het feit dat de Wereldbank besloten heeft om zich terug te trekken, probeert Turkije dit project toch voort te zetten. Zelfs Europa twijfelt momenteel zeer sterk over een financiële steun aan dit project. In de afgelopen jaren zijn er in deze regio enorme hoeveelheden waardevol cultureel erfgoed verloren gegaan sinds de start van een gigantisch project waarbij men in totaal zo'n 22 dammen en 19 waterkrachtcentrales tracht te bouwen. De Atatürk Dam is hier een goed voorbeeld van, deze dam zette de stad Nevali Cori onder water. Kort voordat men aan de bouw van dit dam begon, werd er hier een 9.000 jaar oude tempel opgegraven. Ten westen van Urfa zette de Atatürk Dam ook de antieke plaats Samsate onder water. Deze stad werd 130 jaar voor de christelijke jaartelling gebouwd.

Stroomafwaarts van de Atatürk Dam bevindt zich de Birecik dam, die in 2000 de overblijfsteden van de klassieke tweelingsteden Apamea en Selucia onder water zette. Deze tweelingsteden stonden bij de oude Grieken bekend als Zeugma (brug), naar aanleiding van een indrukwekkende brug die de beide oevers van de Eufraat met elkaar verbond (en zo ook de tweelingsteden). De tweelingsteden zijn een spiegel van de woelige geschiedenis in deze regio. Beide steden bloeiden op onder de regeerperiode van Seleucius I, stichter van het Seleucidische Rijk in de 4^{de} eeuw voor Christus. Seleucius nam deel aan de veldtocht van Alexander de Grote en kreeg controle over Mesopotamie en een deel van klein Azië door een overwinning op Antiganos in 301 voor Christus.

De Romeinen veroverden de stad in het jaar 73 en maakten er een belangrijke garnizoenstad van. In de christelijke tijd werd de stad een belangrijk bisdom.



In de 3^{de} eeuw werd de tweelingstad door de Perzen veroverd en in de 7^{de} eeuw in een oorlog waarbij de Perzen betrokken waren grotendeel door Charroes II verwoest. Recente opgravingen hebben talrijke monumenten uit de Romeinse tijd blootgelegd. De steden bleken bovendien regelmatig en rechtlijnig gebouwd te zijn, met van noord naar zuid een indrukwekkende 27 meter brede en 1600 meter lange weg, voorzien van een dubbele zuilenrij. Niettemin is Zeugma onder water verdwenen. Ondanks hevige protesten van binnen en buiten Turkije, is ook nu de toekomst van Hasankeyf niet meer zeker. De cultuurhistorische waarde van Hasankeyf en de kans dat deze parel van urbane architectuur over niet al te lange tijd onder water verdwijnt, geeft een grote nadruk aan dit fotoproject. Daarnaast is Hasankeyf nog nooit eerder op een systematische manier in beeld gebracht. Dit is dan ook één van de redenen goed niets veranderen die dit project uniek maakt.

Doelstelling van het project Hasankeyf: "Een cultuur onder water?" Is:

1- De cultuurhistorische waarde van Hasankeyf in woord en beeld vastleggen en Uitdragen.

2- Het bevorderen van een publiek debat tussen Nederlanders, Turken en Koerden over het behoud van (waarbij de nadruk wordt gelegd op de omgang met cultuurhistorisch erfgoed in het algemeen.)

3- Koerdische en Turkse doelgroepen in Nederland zich laten interesseren voor kunst in zijn algemeenheid en fotografie in het bijzonder.

De fototentoonstellingen maken de kern uit van dit project. Deze tentoonstellingen vinden zich plaats in Den Haag, Rotterdam en Arnhem. De reden waarom men deze tentoonstellingen in de steden Den Haag en Arnhem houdt, heeft te maken met het feit dat in deze steden aanzienlijk grote hoeveelheden Koerden wonen. Daarnaast onderhouden deze steden belangrijke bestuurlijke relaties met steden in

en rond het gebied Hasankeyf (Batman).

De tweede doelstelling van dit project namelijk het bevorderen van een debat over het behoud van het cultuurhistorische erfgoed voor de Koerden, is vooral zo belangrijk doordat er in de regio de afgelopen jaren behoorlijk veel waardevol cultureel erfgoed verloren is gegaan door de start van diverse projecten.

De fototentoonstelling werd medemogelijk gemaakt door De Phenix Foundation fonds. Vanaf 18 september tot 18 oktober 2003 is deze fototentoonstelling in het Volksbuurt Museum, Hobbemastraat 120 in Den Haag te bezichtigen.

Hierna zal deze tentoonstelling op twee andere locaties te zien zijn. (t.w. in het gebouw van de Koerdisch Arbeiders en Cultuur Vereniging "KOÇ-KAK" te Arnhem en in het Wereld Museum te Rotterdam)



PRESENTATIE VAN DE BUNDEL

"INTERCULTUREEL DEN HAAG- EEN SUCCESSTORY" OP WOENSDAG 28 MEI 2003

